

nerî û got:" ez dibînim darê te hemî yê hinaran e, heme têra min hinar bide min, mala te ava be. zîlam rabû derpiyê wî ji hinara dagirt û ew vegeande bîrê.

Deng ji ser bîrê dihat, bang li wan kir: ez mirov im, min ji bîrê derînin. Serokê karwan jê re got heme dewarê me avde emê 1000 perî bidine te, dewl jê re rêkirin, ewî jî dagirtin ta ku dewaran têr vexwar. werîsê vala jê re rêkirin, wî xwe pê girt, ew kişandin ta ku ji bîrê derket. Peryên xwe ji wan standin û ji wan pirsî berê we li kû ye?. Wan got: Emê herin filan derê. De naxwe van hinar û peran bidine jina min. Cihê mala xwe ji wan re da naskirin, xatir ji wan xwest û berê xwe da Bexdayê da bigihe karwanê xwe yê berê.

Serokê karwên pere û hinarên wî gihandin jina wî, kêfa wê gelekî hat, perê xwe hilandin. Lê bû êvar, ji xwere got de ka ez hinarekê ji xwe re bişkênim, dema hinar şikand dît gava libê wê hemî bûne dur û yaqût!! Ew matmayî ma, durên xwe hilanîn. Lê bû sibeh, rahişte sê liba û berê xwe da dikana zêrker, ew li ser masa wî danîn û jê re got: Buhayê van çiqas e?. Zêrker li wan nerî û got : "Xwîşkê, sê dikanên weke ya min buhayê wan dernaxîne, vêce eger tu bibêjî erê, ezê perên li ba xwe bidim te û yên din piştî sê rojên din. Wê bi"de başe keko" lê vegeand. Perên xwe standin û piştî sê rojan çû yên din jî anîn mal.

Roja dî berê xwe da hostakî, jê xwest ku avahiyeke weke ya şah jê re ava bike, hoste jê re got:" Eger tu 2 milyon pere bidî min ezê di salekê de xilas bikim". "Eger tu di 2 mehan de xilas bikî tê çiqas peran ji min bixwazî?" Wî got : Ev 4milyon pere jê re divên." Ew razî bû û got : Ezê 4 milyon bidim te û leza xwe bike."

Piştî 2 mehan avahiya zavayê Şah amade bû, Xatûnê ji xwe re dergevan û navmalî danîn. Piştî heftiyekê mêrê wê ji Bexdayê vegeheriya û hate bajarê xwe û çû cihê xaniyê

xwe , ooo ev çî ye..??!! ka xaniyê min?!. Wî cînarekî xwe dît, jê pirsî : Qey ev ne mala min e? Belê cînar, piştî tu çûyî, pîreka te ev avahî di şûna xaniyê te de ava kir. cînarê wî bersiva wî da. Çû da ku derbasî xanî bibe, dergevan nehişt ew derbas bibe.Jê re got: Keko ev mala min e. Rabûn gazî pîrekê kirin, ku mirovekî bi vî rengî hatiye û dibêjê ev mala min e. Pîrekê ferman da "bila derbas bibe". Ew derbasî malê bû, silav li hev kirin, mêrik ji jina xwe pirsî : Ev çilo çêbûye?, Gelo ez di xew de me ?!..Wê got : Na, ev bi sê liban ji wan hinarên te çê bûye, û min yên dî hilandine". Jina wî berdewam kir,çekin nû ji mêrê xwe re kirin û bi vî rengî ew jî bû "efendî ". Ji hev re gotin: Emê Şah vexwendî ser xwarinekê bikin, lê divê ew me nasneke. Pîrekê çekên mêran li xwe kirin û li ser masê bi wan re rûnişt. Piştî ku Şah têr xwar, çû da ku destê xwe bişo, keça wî li pey çû, Şah jê pirsî win kî ne?! Em herdû birayên hev in, me kar kiriye ta ku me têr xwariye û em zengîn bûne, şah pûnîjî ...Keça wî jê pirsî: Çima tu diponijî Şahê min?.. Bi Xwdê keçeke min hebû, min da yekî perîşan, ez nizamim rewşa wê çî ye û çî pê hatiye?. Xwezî berî niha tu buhata vî bajarî, min ê keça xwe bida te!! Di cih de keça wî desmal ji ser serê xwe hilanî, bavê wê ew nas kir, keça xwe hembêz kir û jê pirsî : Ev çî ye keça min ? "Ev e ew mêrê ku te ez dabûmê, ka vêca pîrek mêran dikan mêr an na ?! "..Belê keça min rast e, pîreka jîr û zana mêran dike mêr, gotina te ya rast bû keça min û ez şaş bûm li min bibore..!

